

Divê bikujên Emîn Îsa El-Elî di zûtirîn dem de werin eşkerekirin

Kurdistan Siûd Xidir



Malbata Emîn Îsa El-Elî bang li hemû aliyên navdewletî, rêxistinên yasayî û mirovî, Hevpeymaniya Navdewletî û komîteyên pêwendîdar ên Netewên Yekgirtî dike, ta ku hûrgiliyên tawana kuştina kurê wan

di bin eşkenceyê de werin aşkerekirin. Malbata Emîn Îsa El-Elî di daxuyaniyekê de ragihand, "Hêzeke Asayîşê roja 222021/5/ Emîn Îsa El-Elî wek şahidê li ser dozê ji mala wî ya li Heseke birin, lê me termê wî roja 282021/6/ wergirt û şûna eşkenceyên

hovane li ser gewdê wî hebûn." Malbatê di daxuyaniyê de hûrgiliyên eşkenceya li Emîn Îsa hatine kirin diyar kirin û ragihand, ev tawan di nava raya giştî û civaka navdewletî de deng veda û rastî şermazarkirinê hat û hat xwastin ku tawankar

bêne naskirin û dadgehkirin, lê piştî derbasbûna demeke dirêj, ti encam ji aliyê serkirdatiya HSDê ve nehatin aşkerekirin. Malbatê diyar kir, wan helwesta xwe berê ji raya giştî re ragihandiye ku ew amade ne careke din gora Emîn

li pêş dezgehên ragihandinê, xelkê û kesên pispor vekin û pişknî li ser termê wî bê kirin. Herwiha Malbata Emîn Îsa Elî bang li hemû aliyên navdewletî, rêxistinên yasayî û mirovî, Hevpeymaniya Navdewletî û komîteyên

pêwendîdar ên Netewên Yekgirtî kir ku li aliyên wan rawestin û fişarê bikin ta ku lêkolîneke dadwerane were kirin û hûrgiliyên tawana kuştina kurê wan werin aşkerekirin.

Armanca revandina endamên PDK-S astenkirina danûstandinên Kurdî ye



Kurdistan-
Bidûvçûn

Di 17ê Tîrmehê de her yek ji endamê desteya rawêjkariya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya Mihemed Deham Eyo li bajarê Qamişlo, û endamê encûmena şaxî ya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya Izedîn Mela li bajarê Qamişlo, li gundê Abirê yê ser bi navçeya Çil Axa ya Dêrikê ve, endamê encûmena herêmî ya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya Mihemed Ehmed Salih. Û li navçeya Girkê Legê jî nûçegihanê me Berzan Hisên ku endamê encûmena şaxî ya PDK-Sê ye ji aliyê çekdarên PYDê be hatin revandin. Mekteba Siyasî ya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya (PDK-S) daxuyaniyek derbarê revandina endamên wê ji aliyê hêzên ser bi PYD ve belav kir û ragihand, "Ev kiryar xizmeta pêşeroja gelê me û doza wî nakin û kedên serxistina danûstandinên Kurdî jî sînordar dikin." Mekteba Siyasî ya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya di daxuyaniyekê de ragihand, "Di çarçoveya rewşa dijwar û gelê me tê de dimîne de, çekdarên ser bi PYDê ve şeva borî 17ê Tîrmehê dest bi kampîneke revandina kadro û endamên me kir." Li gor daxuyaniya PDK-Sê, navên endamên PDK-Sê yên hatine revandin, wiha

ne:

- Endamê Encûmena Herêmê yê PDKê li Çilaxa Mihemed Salih Şelal Ehmed.
- Endamê Encûmena Herêmê yê PDK-Sê li Qamişlo Izedîn Zênilabidîm Mehûmd.
- Endamê Komîteya Şewirmendiyê yê PDK-Sê û Serokê berê yê Xwecihîya ENKSê li Qamişlo Mihemed Deham Eyo.
- Endamê Encûmena Herêmê yê PDK-Sê li Girkê Legê Berzan Husên. Polîtburoya PDK-Sê diyar kir jî, roja 13ê Tîrmehê jî endamê wan Fermez Ebdulkerîm li Dêrikê û roja 22 Gulanê Ebdilxefar Mihemed li Çilaxa hatibûn revandin. Mekteba Siyasî ya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya di daxuyaniya xwe de radigihîne, "Ev kiryarên tirsandinê û siyaseta bêdengkirinê, tenê nişaneyê têkçûna vê rêveberiyê ye, ew li her bihaneyekê digere ta ku nêrînên cuda serkut bike û desthilatdariya xwe bi zorê çekê ferz bike." Di beşeke din a daxuyaniyê de hat: "Em wek Mekteba Siyasî ya Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya, em van kiryarên li dijî mafên mirovan û azadiyan bi tundî şermazar dikin, ev kiryar xizmeta pêşeroja gelê me û doza wî nakin û kedên serxistina danûstandinên Kurdî sînordar dikin." Di dawiya daxuyaniyê

de, PDK-Sê bang li aliyên navdewletî yê pêwendîdar dike ku erk û pabendiyên xwe yên rêgirtina li bînpêkirinên li dijî kadroyên ENKSê bi cih bînin. Herwiha bang li hêzên niştimanî û hêzên Kurdistanî kir, fişarê bikin, ji bo kesên hatine revandin werin azadkirin. Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) revandina endamên Partiyê Demokrata Kurdistan-Sûriya (PDK-S) ji aliyê çekdarên PYDê ve şermazar kir û daxwaz ji serkirdatiya HSD û Amerîka kir, destêwerdanê bikin û van girtiyan azad bikin. Sekreteriya Giştî ya ENKSê di daxuyaniyekê de ragihand, "Tevî bangewaziya ji aliyê dost, civak û rewşenbîran a ji bo serxistina danûstandinên û gihîştina bi rêkeftineke Kurdî - Kurdî, lê berûvajî wan bangewaziyan û li dijî perensîpên mafên mirovan, dezgehên ewlekariyê yên PYDê roja 17ê Tîrmehê hejmarek ji endamên PDK-Sê revandin. Sekreteriya ENKSê diyar kir, Mihemed Salih Ehmed li Çilaxa, Izedîn Mehûd li Qamişlo, Mihemed Eyo li Qamişlo, Berzan Husên li Girkê Legê hatine revandin û li Kobanê jî bi ser mala serkirdêyê di Partiyê Yekîtiya Kurdistanî Weysî Şêxî de hatiye girtin. Sekreteriya ENKSê dibêje, girtina van çalakvanan, sivikkirina bi

raya giştî û serkutkirina bir û baweriyên cuda ye û armanc ji van kiryanan, hilweşandina danûstandinên Kurdî - Kurdî û gihîştina bi rêkeftineke yekrêziyê di vê qonaxa niha ya hestiyar de ye. Di daxuyaniyê de hat, "Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê van bîncavkirinan şermazar dike û bang li serkirdatiya HSD û Amerîka wek serperîştîyara danûstandinên Kurdî - Kurdî dike, destêwerdanê bikin û sînorekê ji van bînpêkirinan re deynin û van girtiyan azad bikin." Ji aliyê xwe ve, Rêxistina Peyamnêrên Bêsînor derbarê revandina 3ê rojnamevanên kurd ji aliyê çekdarên PYDê li Rojavayê Kurdistanê daxuyaniyek belav kir, tê de bi tundî girtina 3ê rojnamevanên kurd şermazar kir. Rêxistina Peymanêrên Bêsînor weha di daxuyaniya xwe de dibêje: Li rêkefta 17 Tîrmeha 2021ê, çekdarên PYDê li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê, her yek ji rojnamevan Ezedîn Mela rêvebrê rojnameya Kurdistan, peyamnêrê kenala ARK Berzan Hisên û Mihemed Salih peyamnêrê berê yê kenala Kurdistan tv revandin, û heta niha çarenivîsa wan ne diyar e. Di vê derbarê de rêxistina navhatî di daxuyaniya xwe de bi tundî ev kiryar ku dermafê 3ê rojnamevanên

kurd ji aliyê çekdarên PYDê ve hatiye encamdan şermazar kir û banga serbestberdana wan kir. Partiyê Azadiya Kurdistanê (PAK) derbarê girtina endamên Partiyê Demokrata Kurdistan - Sûriya (PDK-S) ji aliyê asayîşa Rojavayê Kurdistanê ve daxuyaniyek belav kir û ragihand, girtina endamên partiyên siyasî, hem zerarê digihêne xebatên lihevkerinê, hem jî bînpêkirina azadiya ramanî û xebata siyasî ye. Buroya Çapemenî û Ragehandinê ya PAKê di daxuyaniya xwe de ragihand: "Li gorî agahdariyên ku di ragehandinê de belav bûne, Sekreteriya ENKSyê diyar kirîye ku, roja 17ê Tîrmehê endamên PDKSyê Mihemed Salih Ehmed li Çilaxa, Izedîn Mehûd li Qamişlo, Mihemed Eyo li Qamişlo, Berzan Husên li Girkê Legê Şêxî ji aliyê dezgehên ewlekariyê yên PYDê ve hatine revandin û li Kobanê jî bi ser mala serkirdêyê di Partiyê Yekîtiya Kurdistanî Weysî hatiye girtin. Di demeke ku di nevbeya PYNK û ENKSyê de danûstandinê ji bo lihevkirina Kurdî - Kurdî tê meşandin de, li Rojavayê Kurdistanê girtina endamên partiyên siyasî, hem zerarê digihêne xebatên lihevkerinê, hem jî bînpêkirina azadiya ramanî û xebata siyasî ye. Em bangî birêveberên Rêveberîya Xweser, HSD, PYNKyê û bangî Berpirsên Dewleta Emerîkayê yên li Rojavayê Kurdistanê berpirsyan in dikin da ku rê li ber van girtin û îşkenceyan bigirin û nehêlin hewl û xebatên lihevkerina Kurdî - Kurdî zerarê bibînin. Hemû girtiyên siyasî, rewşenbîr û aktîvistên mafê mirovan yên li Rojavayê Kurdistanê divê demildest bêne berdan."

Zilma siyasî dibe sedema asêkirina asoya zanistî



Mahir Hesên

Çûna nav rewşek a şer li deverên Kurdan de ji destpêka kirîza Sûrî nîşan dide, û diyar bû ku gera dîplomatîk de jî, banga rawestandina bînpêkirinên li dijî Kurdan li Sûriyê kêmbû. Lê ev nayê wateyê ku ew di doza xwe de berdewam nakin, û nabe ku Kurd li hemberî dijberên xwe neçar bimîne û dev ji hin daxwazên xwe berde. Di warê bînesazî, xizmet û mercên jîyanê de, Kurd di rewşek pîr lewaz û giraveke bêhedan de derbas dibin, ne ji bo Oposîsoyn û ne ji rejîmê re ewqas cihê xembariyê ye. Ew bi demokrasiyek leylanî, xapandin û bêhêvîtiyê û hêrsbûnê bi kurdan dikin û bi ser wan de divêrin!

Pirs têtê kirin : Hûrguliyên ku cûdahiya negatîf an erênî di navbera Partiyên Kurdan de çêdikin, heye ku di dawiyê de derbas bibe?! Ji bo çî desthilatdariya PYDê dest bi lêgerîna razîbûna civakê û mîletê xwe nakin, heya ku di rêza pêşîn de pileya yekem mafên kurdan li Sûrî be li gorî yasayên Navdewletî bidine naspêdan. Tenê li razîbûna pêkhatiyên deverê digere û xwe li ber wan sist dike û serserê kurdan ewqas mêrxas û degel dibe.

Ji ber vê yekê, bi destveanîna jîyanek xweş an aza heya bête peyda kirin, bi piştgirîyek zanistî û gotinên realist dive, lê PYD e kesên zikreş û duxum dide pêş, û silogan û durşmên pkk bilind dike hemberî ENKS weku nîşanekê an jî nameyekê ku mirovên kor tê bigihe

ew dijî bi dawî anîna şer in. Çingo PKK bi şeran temenê xwe dirêj dike û mîletê xwe di xapîne û xwe bi şehîdan mezin dike.

Di veguhastina pergala desthilatdariyê de, bi derketina serdeman û çirûskên biratiya gelan ên di dîrokek bi dijminê me re damezirandin û hilweşîna daxwazên ava kirina dewletê, ku ev bîngeha prensîbên ku ji hêla pergalek siyasî a PKK ve hatine ferz kirin, lê belê tev ji ber berjewendiyên leşkerî, û siyasî.

Ev zilma siyasî ji bo hilweşîna mafê mîletê kurd faktorek vejîyayî ye. Partek vejandî ji nezan e. Ya ku ji hêla dewleta tirk

ve hat birêkûpêk kirin û xurt kirin, û hin rewşên xirab di afirînîna heya vê demê, li vir û wir ronahî nedome, ku armanc ew e em bikevin cîhek tarî hê jî çavên me kor dike.

Lêbelê, ev nayê rewa kirin ku hişmendiya siyasî nebû sedema darizandinê di nav tevgera kurdî de û derfet bo Zordariya siyasî ya ku desthilatiya apoçiya li rojavayê welête de dest pê kir, em dibînin ku ew di hemî sedem û faktorên hilweşînê de ye ku piştî millet êşandin û koç kirin. Nebûna berpirsiyariya siyasî zelalîyê tarî dike, gendeliyê di nav gelek tevgera kurdî û sistî derdixe, kambaxî berbiçav e, û dizî li gorî hewes û meylên zîlamê

zalima ye, û rijandina xwîn normale. Herwisa tawanên serdest û lihevhatî mafdarên sûcedar dike, tenê li ser parastina text û keleha xwe di livin. Her wusa, zilma siyasî dibe sedema asêkirina asoya zanistî, û rawesandina pêvajoya pêşkeftina perwerde û zanistîye. Di nebûna azadî û mafan de, raman dibe tawanek, û vegotina rastiyê riya herî zû ya ber bi mirin ve ye, heya ku mirovê aza dijayetiya kesên serdest û zalim bike, û têkçûna wî di karûbar û rêvebirina gel de, û pêdiviyên jiyana wan pêk bînin rawstî nexweşî û tawanên tê. Diyar e ku yekdestdariya

PYDê ya li desthilatdariyê buye bela bi serê xelkê me de û hat, hê jî siya xwe davêjin ser rastiya me, wek astek ku ji xwe re li nakokiyên tehil bi partiyên Kurdî re digerin, û nezanî û paşverûtî didome, û tevgera çandî û rewşenbîrî hate rûxandin, û wê jî wenda kir, li ber çav e rêjeya kesên xwendî (ango kî dikare bixwîne û binivîse) di dema desthilata PYDê de li paşa û bê bandor e. Ji ber vê yekê, partiya Yekîtiya demokratîk nikaribû bi şaristanîyê re berdewam bike, ku dest bi girtina rê li ber rabûn û rabûna ber bi ronakbîriyê û şoreşa pîşesazî û zanistî ve kir, ku tu gav bê wê nebête avêjtin.



Ev 5 sal in xwedanê dengê resen Bavê Selah ji nav me bar kiriye

Kurdistan

Dengbêjê Kurd Ebdilrehman Omer (Bavê Selah) 1952an li gundê Gorda yê Efrînê ji dayik bûbû û jiyana xwe li gundê xwe û bajarê Helebê derbas kiribû. Bavê Selah wek dengbêjekî herî navdar di warê starnbêjî û starnên Kurdî yê kevnar de li Rojavayê Kurdistanê û li perçeyên din yê Kurdistanê dihat naskirin. Bavê Selah di destpêka salên 80î de dest bi dengbêjiyê kir û piştî tevî koma Armanç bû û bi hevalên xwe re dest bi tomarkirina kasêtan kirin û di kasêta 4 çarem de ji Bavê Selah dastana Delal (Derwêşê Ebdî) tomarkir û navûdengê wî zêdetir belav bû. Bavê Selah di piştî

dastana Delal, Dastan û stranên Cebelî, Şêx Seîd, Xec û Siyamend, Gênc Osman, Hecanê û gelek stranên din ên folklorî tomar kirin û gelek destanên Çiyayê Kurmênc ji windabûnê parastin. Bavê Selah li Kurdistanê û gelek welatên Ewropa, Rûsya, Libnan, Urdir û Îmarata Erebi û welatîne din aheng û şevbuhêrk bi starnên Kurdî pêk anîbûn, herwiha bi dehan kasêt û perçeyên vîdyo tomar kirine. Bavê Selah ji dayika xwe Gulê û bapîrê xwe dengbêjê Efrînê yê navdar Îbrahîmê Tirko û dengbêjên din ên wek Cemîl Horo, Ehmed Axa û Silêmanê Aho fêrî stran û destanên Kurdî bûbû. Herwiha Bavê Selah xwe yek ji şagirtên hunermendê

mezin Adîk dizanî, Adîkê jî berî koçkirina xwe, tembûra xwe diyarî Bavê Selah kiribû. Bavê Selah Kurdperwer û xwediyê dengê çiyayî bû û ji ber Kurdbûnê û stranên xwe ve, gelek caran ji aliyê rêjîma Sûriyê hatibû girtin û di zîndan de ji rastî eşkenceyê hatibû. Bavê Selah ji ber krîzeke dil roja 14ê Tîrmeha 2016an li nexweşxaneyê Avrîn a bajarê Efrînê koça xwe ya dawî kiribû û bi beşdariya bi hezaran hezkiriyên wî û xelkê Efrînê li gundê xwe, bi xakê hat spartin. Welatîyên Efrînê li ser Bavê Selah û hunera wî ji rojnameya Kurdistan re neryna xwe anî ziman. Dilşad wiha li ser Bavê Selah û hunera wî dibêje, Bavê

Selah ti carî nayê jibîrkirin û dê di hiş û raman û bîra me de bimîne, lewma divê hunermendên me yê niha rêka wî bigrin û parastina kiltûrê Efrîna rengîn bikin da ku wî nebe û her bimîne zindî di nava foloklorê deverê de, heger mirov dema li Bavê Selah guhdarî dike hestekî cêwaz tê wî û ev ji taybetmendiya dengê Bavê Selah e, ez bawerim dikim tevahiya xelkê Efrînê aşiqê dengê Bavê Selah in ji berk u wî bi hunera xwe ya resen navûdengê xwe ne tenê li Herêma Efrînê belku li seranserê kurdistanê Sûriyê çê kir.

Sîham jî wiha li ser Bavê Selah dibêje, hunermendê mezin Bavê Selah nayê dubarekirin û wî hunera xwe di serê her takekî Efrînê de çandiye, û vê yekê jî hiştiye hezkirina wî di dilê her Kurdekî de hebe, Bavê Selah kesekî Kurdperwer û niştîmanperwer bû, û gelekî ji xak û welatê xwe hez dikir, û wî ti carî xaka Efrînê ne dida bi mal û xaka dunyayê, ew xemxurê Efrînê bû, bi rastî kesên wisa nayên jibîrkirin û dê di mejiyê me de bimîne zindî.

Henan jî wiha li ser Bavê Selah dibêje, divê em zarokên xwe fêrî hezakirina dengê resenê Bavê Selah bikin da ku ev deng ji bîra wan neçe û her di mejiyê wan de zindî bimîne, ev yek erkê her Kurdekî Efrînê ye û nabe em vê mijarê piştguh bixin, divê em li ser vê mijarê kar bikin û dengê Bavê Selah di guhê her Kurdekî Kurdistanê Sûriyê zindî bihêlin.



Hewramana Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê UNESCO ve hat tomarkirin

Kurdistan-Bidûvçûn

Berpirsê Navenda Kulturî ya Devera Hewraman a Rojhilatê Kurdistanê Pûya Talibniya ji medyaya Îranê re gotiye, dîmen û rûyê kulturî yê devera Hewraman di çil û çaremîn civîna UNESCO de hat pesendkirin û tomarkirin. Pûya Talibniya diyar kiriye ku ewê hewl bidin rûyê din yê Hewraman jî, ku

pêwendiyên navbera mirov û jîngehê de ye, bi UNESCO bidin tomarkirin, ji ber ku pêwendiyê gelekî bihêz û germ di navbera mirov û jîngeha Hewraman de heye. Talibniya eşkere kiriye ku rûbera ku ji aliyê UNESCO ve hatiye tomarkirin, 106 hezar û 307 hektar e. Devera Hewraman girêdayî bajarokê Serwava li parêzgeha Sine ya Rojhilatê Kurdistanê ye. Hewraman hevşînor e bi devera Hewramana Başûrê Kurdistanê re.

